HDP

# BULTENA ÇANDINIYÊ

- Endeksa bihayên zadê ya kûrewî ya ji aliyê Neteweyên Yekbûyî û Rêxistina Zad û Çandiniyê (FAO) hatiye berhevkirin di meha mijdarê de %0,15 ket xarê û ji meha çile vir ve asta xwe ya herî kêm dît; di binyata salane de jî % 0,3 bilind bû.
- Endeksa Kûrewî ya Meha Kanûnê ya Zad û Çandiniyê ya FAO'yê di binyata mehane de %1,9 kêm bû, di binyata salane %1 daket xarê. Bi vî awayî li dinyayê bihayê zadê di meha 9'an de bê navber ket, ligel vê li Tirkiyeyê enflasyona zadê di asta %77'an de ye.
- Di nav sala 2022'yan de, di nav berhemên zadê de berhemên herî zêde bihayên wan bilind bûne, berhemên şîr in. Li gorî meha kanûnê, di xelekên markêtên mezin de bihayê pênîr di navbera154 û 200 TL guherî û bihayê goşt derbas kir.
- Heta îro, ji 'korîdora dexlê' ya ji bo xetereya "qeyrana zadê" ya ji ber şerê Rûsya-Ûkraynayê qewimî ji holê rake 524 keştî û 13 milyon tonan zêdetir dexil hatiye derbaskirin.
- Li gorî daneyên Wezareta Çandîniyê ya Ûkraynayê, Rûsya'yê ji şerê Ûkraynayê vir ve Ûkranyayê nêzî 39 milyon ton dexil, tovê bidon û berhemên ji çêkirî firotiye welatên derve. Ji aliyê Ûkraynayê ve domana deh mehan de 15,6 milyon ton garis (gilgil), 8,6 milyon ton genim, 3,3 milyon ton kanola û 2,7 milyon ton tovên gulênberberiroj hatiye firotinderve.
- Li gorî dawiya 2022'an  hejmara cotkarên ku ji Zîraet Bankê kredî bi kar anîne nêzî 930'an û mêjera (miktar) jî 211 milyar TL'yan derbastir bûye.
- Di sala 2022'yan de cotkarên ku debara xwe bi sewalvaniyê dikin, ji ber ku maliyeta heywanan ji bihayê berhemên ji heywanan tên bidestxistin zêdetir e, zirar kirine û li wan ferz bûye ku heywanên xwe bifiroşin. Bihayê bingehîn ê ji aliyê Saziya Goşt û Şîr (ESK) hatiye diyarkirin, 8,5 TL ye, ligel vê yekê maliyeta lître şîr 12,9 TL'yî derbastir bûye.
- ESK li ser bingeha Peymana Bazirganiyê ya Serbest di 11 mehên di sala 2022'yan de ji Bosna Hersek'ê tenê 400 ton goştê bêhestî bi bihayê 7 eûroyî ji derve hatiye kirîn. Tê payîn ku ESK di meha kanûnê de jî hezar ton goştê bêhestî bi bihayê 7.20 eûro ji derve bikire. Sala borî ji Bosna Hersek'ê bi bihayê 5,10 eûro goşt dihat kirîn, lê belê îsal bihayê goştê ji dervetêkirîn bi binyata eûro 2,10 eûro zêde bûye.
- Li gorî belgeya ji aliyê Konseya Goştê Sor a Neteweyî ku bi hefteyî tê aşkerakirin bihayê serjêkirinê yê goştê golikan ê bêdon û goştê berxan ê bêdon, di meha kanûnê de bihayê serjêkirinê goştê karkas kêm-zêde 5 lîra bilind bûye. Li gorî vê serjêkirina goştê bêdon li Herêma Egeyê 108 TL, Herêma Derya Spî 106,5 TL, Herêma Marmarayê 107,50 TL, Herêma Anatoliya Navîn 106,80 TL, Herêma Anatoliya Rojhilat, 107,50 TL, Herêma Anatoliya Başûrê Rojhilat 106,2 TL û Herêma Derya Reş bûye 110 TL.
- Li gorî daneyên TÛÎK'ê di cotmeha sala 2022'yan de mêjera şîrê çêlekan ê berhevkirî  li gorî sala borî %9,6 kêm bûye. Di cotmeha sala 2022'yan li gorî sala borî berhilîna rûnê nivîşk %27,1, şîrê ji bo vexwarinê %24,1, berhilîna dew %13,3, berhilîna penîrê çêlekan %5,4, berhilîna mast %3,9 kêm bûye.

- Konseya Şîr a Neteweyî, bihayê referansê yê şîrê xav weke 8,5 Lîra disepîne, li Bîgaya Çeneqeleyê di civîna diyarkirina bihayê şîr a bi fîrmayên şîr re, bihayê şîrê xav ê cemidandî ji 1'ê çile 2023'yan şûnde weke 12 TL hatiye diyarkirin.
- Li navçeya Kozana Edeneyê di encama wergerandina romorka traktorê ya karkerên fîdan dadiçikandin lê siwar bûbûn 35 karker birîndar bûne.
- Li gorî Yekitiya Firotinaderve ya Derya Reş (DKİB) Tirkiyeyê di 11mehên pêşîn ên sala 2022'yan de di beramberiya 15 hezar 564 ton hingiv de 41 milyon 503 hezar dolar pere bi dest xistiye.
- Li gorî daneyên Greenpeaceya Tirkiyeyê para park û baxçeyên li bajarên mezin a di nav bajêr de bi dorê; Viyana %45, Roma %39, Londra %33, New York %27, Stenbol %2,2 ye.
- Enflasyona Mezaxtinê ya Çandiniyê UFE, îmze avête bin rekoreke nû, di meha mijdarê de, di binyata mehane de %7, di binyata salane de %169,45 zêde bû.
- Bi biryara Serokkomariyê Kadîr Çokçetîn ji bo Gerînendetiya Giştî ya Parastina Xwezayê û Parkên Milî ya Wezareta Çandinî û Daristanan, Menderes Ozlû ji bo Sereke Mufetişiya Wezareta Çandinî û Daristanan û Mustafa Sûslû ji bo Alîkariya Gerînendetiya Giştî ya Farîqeyên Şekir ên Tirkiyeyê hatine diyarkirin.
- Ji aliyê Saziya Reqabetê, Coca-Cola İçecek, Saziya Reqabetê ve girêdayî ji bo şirîkatiya Coca-Cola Firotin û Belavkirin Ş A. 272,2 milyon lîra cezayê pereyê îdarî hatiye dayîn. Coca-Cola İçecek, wê %25 pereyê ceza daxistina bi dayîna zû sûdwergire û 204,1 milyon lîra bide.
- Li gorî daneyên TÛÎK'ê yên di meha mijdarê sala 2022'yan de Endeksa Baweriyê ya Mezaxtêran %76,6, meha kanûnê si sala 2022'yan de bi %1,3 kêmbûnê bûye %75,6.
- Li gorî Saziya Îstatîstîkê ya Tüirkiyeyê, Endeksa Bihayên Ketanê (gîrdî) yê Çandiniye %138,15 in, di cotmehê de daketine asta %134,76'an.
- Li gorî daneyên Konseya Baqilan a Neteweyî mêjera eraziyê çandiyê yê ji bo şûvkirinê tên hiştin miktarı 31 milyon dekar e, eraziyê terxan hatiye hiştin 20 milyon dekar e û mêjera yekûna eraziyê hatiye rakirin 235 milyon dekar e.
- Nanê somûn ê 210 gram li Van'ê 3,5 TL'yan tê firotin, bûye 4 TL.
- Li gorî daneyên Komeleya Gihandiyan a Hemû Şîr, Goşt û Dewarên Kel (TÛSEDAD) di meha kanûnê de serê bihayê berhilîna lîtreyek şîr li ser cotkaran 12.90 l,îra.
- Berhilînerê zadê yê fransî koma Cofigeo, ji ber bihabûna enerjiyê ji bo mehekî 4 fabrîqeyên xwe girtine, berhilîna xwe %80'ini biryara rawestandina kar daye.
- Tirkiyeya ku di qada cemawerî, taybet û kooperatîfan de yekpare 33 fabrîqeyên wê hene û di berhilîna silqan de di serê welatên dinyayê de tê, li gel ku ew qas xwedî qapasîteya grîng a razemenî û berhîlînê ye di sala 2022'yan de 550 hezar ton şekir ji derve kirî, ji bo şekir 404 milyon dolar pere da.
- Buroya Qeyda Krediyê (KKB), li 28 bajaran 1066 cotkarên "fiîlî" û "çalak" berhilîna çandiniyê dikin re "Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê" pêk aniye.
- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê di sala 2020'an de temenê navînî yê cotkarên berhilîna çandiniyê dikin 51,3 di sala û 2022'yan de bilind bûye 52,7'an.
- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê yên 2022'yan kesên ku beşdarî rapirsînê bûne %61'î berhilîna nebatî, %38'an berhilîna nebatî û sewalî pêk anîne.

- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê yên 2022'yan cotkarên ku berhilîna nebatî dikin, arîtmetîk navbeyniya meziniya eraziyên ku "çalak" berhilînê lê dikin 267 dekar (26,7 hektar), navbeyniya geometrîk 108 dekar (10,8 hektar), navbeyniya harmonîk jî 39 dekar (3,9 hektar) e. Navbeyniyên arîtmetîk û geometrîk ji sala 2019'an vir ve zêde dibe, navbeyniya harmonîk zêdebûneke gelek bi sînor amaje dike. Ev yek nîşan dide ku li welatê me kargehên piçûk hê jî kargehên herî berfireh in.
- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê yên 2022'yan nîşan didin ku yekûna eraziyên cotkar li ser berhilîna nebatî dikin %29'an bi kirê ne.
- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê yên 2022'yan sê zeviyên ku cotkar serê pêşîn tercîh dikin, bi dorê genim, gilgil û ceh; ji cureyê sebze frengî, cureyê fêqî jî tirî ne.
- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê yên 2022'yan ji her deh kagehên ku sewalvaniyê dikin heftên wan karê şîrê çêlekan (%70), sisêyên wan xwedîkirina conega (%36), dîsa nêzî sisêyan xwedîkirina pez  (%29) dikin. Hejmara sewalan a navbeynî çêlekên şîr 24 (çêlekên doşanî), di kargehên dermale 70 conega, di kargehên pez de, 280 mîh-bizin in.
- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê yên 2022'yan, di lêkolînê de pirsa ji cotkaran hatiye kirin ku berhemên nebatî li gorî çi dikin %73'yan "berhemên ji berê ve zanin", %27'an "berhema ku texmîn dikin sala bê bihayê wê zêde bibe", % 25'an "berhemên ku sewal weke alif dixwin", %23'yan "berhemên ku kiroxên wê pir /firotina wan bi lez" tercîh dikin.
- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê yên 2022'yan ji her 10 cotkaran 2 (%20) berhilîna çandinî ya bipeyman û ji van cotkaran 54'ên wan ji berhilîna bipeyman kêfxweşiya xwe aşkera kirine. Di berhilîna bipeyman de, li gorî qanûnê peymandanîn mecbûrî ye,  silq (%46) serî dikişîne. Vê genim, frengî, û gilgil dişopînîn.
- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê yên 2022'yan, sê pirsgirêkên îsal herî zêde cotkar rû bi rû mane bi dorê, "bihatiya ketanan" (%98), "pirsgirêkên avhewayê" (%59) û "kêmbûna ava ji bo avdanê" (%31) ye. Van pirsgirêkan "nedîtina karkeran", "ditina keda bikalîte/ erzan", "bilndbûna kirayên erazî"û "nexweşînên çandinî/tiştên zirarê didin" teqîp dike. Pisgirêkên herî zêde yên dema bazakirina wan jî, bi %96 "bihayê herî kêm ê di bin ê hêvî jê re dikin" e.
- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê yên 2022'yan ji cotkaran %63'ü berhemên xwe  "peşin", %34'û "hinek peşin hinek bi wade", tenê %3'yên wan "bi temamî bi wade". Di sala 2022'yan de dahatên çandiniyê cotkarên bi "giştî kêfxweş" in ji %19'an dedikeve 21'î, "yên bi giştî ne kêfxweş in" ji % 56'an derketiye 62'yan. Ji hejmara cotkarên zêdebûna rêjeya her du koman "ne kêfxweş ne nîn in (bê biryar)" bi % 8 bûne sedemê ketinê.
- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê yên 2022'yan cotkarên pê re hevdîtin hatine kirin, ji kesên malê (kesên endamên din ên malbatê jî tê de) %34'an ji bilî dahata çandiniyê xebatên wan nîn in. Ên paşmayî % 66'an ji xeynî dahatên çandiniyê mehaneya teqawitiyê, ji karên din rêk û pêk mehane, dahatên weke esnafî û bazirganiyê jî bi dest diixin.
- Li gorî daneyên Lêkolîna Qadê ya Dîtbariya Çandîniyê yên 2022'yan ji cotkarên ji bankeyan krêdî bi kar tînin %83'yan fînansmana lêçûnên krêdiya çandiniyê, sedî 51'î bi mebesata fînansman razemeniyê bi kar tînin, %15'an ji bo hewcedariyê derveyî çndiniyê bi kar tînin. Yên ku krêdiya razemeniyê bi kar anîne herî zêde ji bo kirîna traktor/makîne (%63), kirîna erazî (%22) kirîna sewalên kel (%16) bi kar anîne. Yên derveyî çandiniyê krêdî bi kar anîne % 67'an ji bo hewcedariyên mal/malbatê %22'yan  ji bo deynê krêdiyeke din, %19'an jî ji bo erebe/xanî krêdî bi kar anîne. Cotkarên krêdiya bankayê bi kar anîne, %51'î tek bankayek, ji sedî 32'yan du banke, %9'an jî bi sê bankeyan re ser krêdiyê têkilîne. Serê cotkaran bankayên navbeynî krêdî bi kar anîne di sala 2022'yan de li gorî sala borî ji 1,6'an bilind bûye 1,8'an.